# Rêbernameya dê û bavan

Kommunales
Integrationszentrum
Kreis Höxter

KULTUR LAND KREIS HÖXTER



Kurdisch

# Dêûbavên hêja!

*„Di her destpêkekê de êrik heye".*
(Hermann Hesse)

Tevlîbûna dibistanan yek ji girintrîn tecrubyên jiyana ciwana ye.
Rojên dibistanê bingeha avakirina jiyana me ye, her tim li bîra me dimîne.
Bandorê li riya pêşroja me dike, her wiha pêşeroja me ya pîşeyî diyar dike.

Ji bo ku zarokê / a we di dibistanê de riya xwe bibîne û bi serkeftî fêr bibe, bi piştgirî û baldariya we hewceye.

Ez û endamên xwe dixwazin ku zarokên we di dibistanê de destpêkek baş bi dest bixin.

Bi vê broşura piçûk em dixwazin piştgirî bidin û rê nîşanî te bikin.
Li vir çend agahî li ser tiştên gelemperî yên ku divê hûn di dibistanê de bigirin ber çav û çawa piştgrî bidin zarokê / a xwe.

Zarokê/a te tenê dikare bi tere xurt be.

Klaus Schumacher

Klaus Schumacher
Rêveberiya navçe Hoexter

KULTUR LAND KREIS HÖXTER

# Hînkirina neçarî

Li Nordrhein-Westfalenê hînkirina neçarî heye. ev tê wateya, ku zarokên ku heta 30yê Rezberê (September) dibin şeş salî, divê beşdarî dibistanê bibin.

Sala nû ya dibistanê herdem di havînê de dest pê dike. Zarok û ciwan divê bi kêmanî deh salan beşdarî dibistanê bibin.


Di destpêkê de ji refa yekemîn heta ya çaremîn diçin dibistana seretayî. Paşê ji refa pêncemîn ta ya dehemîn diçin dibistana navîn.

Hînkirina neçarî bi dawî dibe, gava ku di dawiya saleke dibistanê de zarokê/a we temenê 18an bi dawî dike. Heta vê çaxê divê ew an jî beşdarî dibistanekê yan jî perwerdeyekê bibe.

Her wiha zarokê/a we divê beşdarî hemû bûyerên dibistanê bibe.

**Di serî de**

- Waneyên werzîş û avjeniyê,
- Waneyên olê/exlaqî *,
- Seyranên refê
  herwiha
- Geştên refê.



*Di waneya olê/axlaqî tê nîqaşkirin, bê çi ol hene û çi nirx û qîmet di civaka me de mevcût in. Li vê derê ne armanc e ku mirov bi baweriyên xiristiyanan perwerde bibe.

# Rêgez û Tevgerî li Dibistanê

Di dibistanê de
Bingehên hevjînî û fêrbûnê yasa dibistanê ya NRW ne. Digel vê de di her dibistanekê de rêziknameyên girêdayî wê hene. Di wan de tê nîşankirin çi qedexe, çi destûr e û çawa mirov bi hevûdu re mijûl dibe.

**Bi gelemperî:**

- Em bi rêzdar û heval in û qîmetê hevûdu digirin!
- Keç û xort, jin û zilam wekhev in!
- Her kes wekî xwe tê qebûlkirin!
- Şîdeta fizîkî û devkî qedexe ye.
  Pirsgirêk û pevçûn bi dan û stendiniyê têne çareserkirin.

Hûn ê rêziknameya dibistana zarokê/a xwe bi qeydkirinê yan jî li ba Sekreterê bistînin.

Gelek kes hene, ku beşdarî mezinbûna zarokên we dibin.

**Ew jî ev in:**

- Mamosteyê/ya refê, mamosteyê/ya mijarê,
- rBerpirsiyarê/a dibistanê, Sekreter,
- Xebatkarê/a civakî, Perwerdekar,
- Gerdevan, Bermal/Malxwe,
- Paqijî û hêjî bêhtir.

**Ev kes bi tevahî parçeyek ji tîma dibistanê ne.**

Zarokê/a we pêwistî alîkarî û piştgiriya we ye, ji boyî ku bi serfirazî fêr bi- be.

Li vê derê hin tiştên pêwîst ji boyî alîkariya zarokên we bi gelemperî hene, hûn ê hin agahiyan li vê derê bibînin.

Tenê bi were dikarin zarokên we bi hêz bikin!

# Rapora nexweşiyê/Lêborîn

Girîng e, ku zarokê/a we di dema xwe de biçe dibistanê û beşdarî hemû waneyên xwe bibe.
Zarokê/a we nexweş e, ji kerema xwe re di roja wê de sibehê têkilyê bi dibistanê re deynin û nexweşiya zarokê/a xwe ragihînin. Rewşa zarokê/a we dîsa tendurist e, ji kerema xwe re lêborîneke nîvîskî bidine wî/wê, ta ku bigihînin dibistanê.
Hûn ê di rûpela paş re nas bikin, dê hûn ê çawa zarokê/a xwe lêborîn bi- kin.
Hûn dikarin di demên taybet, wekî pîrozbahiyên olî, cejn û bûyerên çandî de daxwaznameya betlaneyê ji dibistanê bixwazin.

## Têkilî bi dibistanê re

Rojbaş!
Zarokê/a min ________.
Ez bavê/dayika
______ im/me(Nav).
Zarokê/a min di refa mamoste
______ (Navê mamosteyê refê)
de ye.
Zarokê/a min nexweş e.
Ez guman dikim ku zarokê/a min
____ (Dîrok) vegere dibistanê.
Gelek spas,
bi xatirê we

Mein Sohn/Meine Tochter
„_____“ (Name)
konnte am ______ (Datum) nicht
zur Schule kommen,
weil er/sie krank war.

Ich bitte Sie dies zu
entschuldigen.

Unterschrift
______

## Lêborîna nivîskî ji boyî dibistanê

Zarokê/a min
______________ (Nav)
nikare _______
(Dîrok) were dibistanê,
ji ber ku nexweş e.

Ji kerema xwe
re lê bibûrin.

Îmze

Hallo!
Mein Name ist „___“.
Ich bin der Vater / die Mutter von
„___“.Er/Sie geht in die Klasse von
Herrn/Frau ______ (Name der
Lehrkraft).
Mein Kind ist krank. Wahrschein-
lich kommt er/sie morgen/am
____ (Datum)
wieder in die Schule.

Vielen Dank.
Auf Wiedersehen.

# Pêdiviyên dibistanê

Zarokê/a te pêwîstî pêdiviyên dibistanê yên bi rêkûpêkirî ne, her wiha divê hemû pêdiviyên wî/wê di çenteya dibistanê ya li gorî temenê wî/wê de, hazir û amade bin.

**Ev tê de ye:**

- Pênûsdank Bi pênûs, pênûstraş, jêbir, pênûsên rengîn, pênûsên darayî, serikên pênûsan, rastkêş.
- Lênûsk û pirtûkên ji bo mijarên ku di vê rojê de têne hînkirin. Hûn dikarin li ser bernameya heftane ya refê bibînin, kîjan mijar di kîjan rojê de ye. spartekan li ber çavan bibin!
- Taştê û vexwarin.

Eger tiştekî din ji zarokê/a we re pêwîst be, hûn ê ji mamsteyê wî/wê agahdar binbin.



# Taştiyeke tendurist

Taştiyeke tendurist li malê û di bêhn-vedanê de gelekî girîng e, ji boyê ku zarokê/a we bi serfirazî fêr bibe.

Vexwarin gelekî pêwîst e! ji kerema xwe re bidin zarokên xwe:

- Av
- ava fêkî yan jî cûreyek
- ji cûreyên çayê

Ji kerema xwe re soda mîna Cola û çaya bûzkirî neşînin bi zarokên xwe re.



# Derfeta beşdarbûna dêûba van ji dibistanê re

Dê û bav pir girîng in di dibistanê de! Ji bo vê yekê dibistan kêfxweş dibe bi beşdarbûn û hevkariya we. Bi vê yekê hûn piştgiriya zarokê/a xwe dikin da ku bi awayekî çêtir fêr bibin.

**Li vê derê çend beş hene:**

- Alîkarî û kontrola spartekan
- Di lênûska spartekan de hin spartek hene, yên ku divê zarokê/a we li malê bi dawî bike, her wiha hin agahî û name ji aliyê dibistanê tê de hene. Ev wekî têkilî di navbera we û mamosteyê refê de têne bikaranîn. Ji kerema xwe re bi awayekî rojane vê lênûskê ber bi çav bibin!
- Têkiliyên şexsî yan jî di riya telefonê re di navbera we û mamosteyê refê de pir girîng in, ji boyî destkeftiyên perwerdehiyê, taybetmendiyên zarok û malbatê. Her wiha ji boyî ku mamoste jî di rewşên awarte de herdem di têkliyê de be bi wer e. Ji kerema xwe re navnîşan û numera xwe ya telefonê bidine dibistanê, gava ku guhertinek di wan de çê bibe.
- Beşdarbûna bûyerên dibistanê yên wekî
  - şahiyên dibistanê,
  - Civînên dêûbavan pir girîng in! Li vê derê hûnê li ser rewşa zarokê/a xwe û guhertinên wan ji mamosteyê refê agahdar bibin
  - Di êvarên dêûbavan de dê û bav bi mamosteyê zarokê/a xwe re dicivin û li ser mijar, bûyer, seyran û betlaneyên refê diaxivin.
- Derbarê zarokên xwe pirs bikin, dê hûn ê çawa alîkariya wan bikin

Dibistan saziyeke demokratîk e, ji vê yekê hûn dikarin wekî bavûdê di na- verokê cûda cûda biryar û dengê xwe bidin. Derbarê wê ev deste hene.

- Civîna refê
  (mijarên refê têne pêşkêş-û nîqaşkirin)
- Civîna dibistanê
  (mijarên dibistanê têne pêşkêş-û nîqaşkirin)
- Konferensa dibistanê
  (li vir biryarên berfireh têne stendin)

# Piştgiriya li malê

Em dixwazin çend fikir û nêrînan bidin we, dê hûn ê çawa piştgiriya zarokê/a xwe li malê bikin, ji boyî ku zarokên we xurt bibin û bi vî awayî berdewam bikin.

- **Balkêşî di rojên dibistanê de:**

Demekê ji zarokê xwe re vala bikin û hewl bidin ku hûn bi wî/wê re biaxivin. Moguća pitanja

**Pirsên gengaz:**

- Roj çawa bû?
- Spartekên te hene? kîjan?
- Agahdarî ji mamosteyê refê hebûn?

Berî bi rojekê çenteyê dibistanê kontrol bikin û binêrin eger pêdiviyên dibistanê bi rêkûpêk in û di ciyê xwe de ne.

Zarokê/a xwe yê/ya di dibistana sereke de ne her sibeh bigihînin dibista- nê.

- **Spartek:**
  Rojeveke kontrolkirî biafirîne bi
  - demên diyarkirî,
  - hawîrdoreke paqij û bêdeng (bêyî TV, Telefon),
  - bi awayekî rojane li lênoska spartekan binêrin, ka zarokê/a çi dike, divê çi bike û eger nameyên girîng di hundirê wê de hene,
  - di pirsgirêkên zarokê/a xwe de alîkar bin,
  - Destekdayînê ji zarokê/a xwe re bi rê bixin.

- **Dema valahiyê:**
  Bi zarokên xwe re pir biaxivin û bilîzin, her wiha çalakiyên hevbeş ên li gorî temenê wan bikin, wekî mînak: xwendina pirtûkan berî razanê, serdana pirtûkxaneyê, park,...

  Hevaltiya zarokên din fêdê li zarokê/a we dike, hûn dikarin wekî mînak zarokê/a xwe li klûba werzîşê, dibistana mûzîkê, dibistana wênesaziyê, yan jî tiştên nêzî van çalakiyan qeyd bikin (BUT).

  Hayê we ji Film û lîskên Computerê yên ne li gorî temenê zarokê/a we hebe!

  Zarokê/a we pêwîstî bikêmanî 8 saet xwe dibe, da ku roja din sibehî bi hêz biçe dibistanê.

# Alîkarî û têkiliyên bi berpirsiyarên zarokan re

## BUT: hevparê fêrkirinê (BUT)

Ev hewildanek ji hikûmeta fedral e, ji boyî zarok û ciwanên ku ji malbatên xizam tên.

Ev dihêle ku zarokên we beşdarî geşt û seyranên dibistanê, xwarina nîvro li dibistanê, destekdayînê xwendinê yên piştî dibistanê bibin, her wiha derfetê vedike ku zarok beşdarî dibistanên mûzik, werzîş, lîsk û çalakiyin din jî bibin.

Kesên ku alîkariyê ji perê kesên bêkar, perên civakî, perên alîkariyê, perên kirya xênî yan jî destûrdayîna zarokan digirin, dikarin piştgiryê ji BUT li ba Jobcenterê bixwazin. Dibistana zarokê/a we (Mamosteyê/a refê, xebatkarê/a civakî, Sekreter) dê bi kêfxweşî alîkariya we bikin.

## Navenda şîreta dibistana herêmî

Dê û bav û şagirtên dibistanê dikarin têkiliyê bi navenda şîreta dibistanê ya herêmî ya li herêma Höxter bikin heke pirsgirêkên wan an pirsên ku bi dibistanê re têkildar in hebe. Hevdîtinên şêwrê bi rêkeftinê pêk tê.

**Demên vekirina sekreteriyê:**
Ponedjeljak i srijeda: 8 sibe - 12 p.
Utorak i četvrtak: 12-ê - 4-ê.
Petak: 08.00 - 11.30.

**Navnîşan û têkilî:**
Westmauer 3, 33034 Brakel
Telefon: +49 5272 / 393368-0
E-posta: schulberatung@kreis-hoexter.de
www.schulberatung.kreis-hoexter.de

# Têkilî / edîtor

Kreis Höxter
Kommunales Integrationszentrum
Haus der Bildung
Moltkestraße 12
37671 Höxter
Tel.: 05271/965 3229

**bi erêkirina dilovanî:**
Kreis Minden-Lübbecke
Schulamt – Kommunales Integrationszentrum
Portastr. 13
32423 Minden

**Nivîsa orjînal:** Patricia Intemann (Kreis Minden-Lübbecke),
ji bo navçeya Höxter hatî nûvekirin: Rüdiger Gleisberg

**Cihê agahiyan:**
Tîrmeh 2020

**Grafik û wêne:**
Titelbild: © Rob - stock.adobe.com
rûpel 3: ©kids.4pictures - stock.adobe.com
rûpel 6: © Pixabay
rûpel 7: ©pinkyone - stock.adobe.com

**Alîkarî û piştgirî ji aliyê:**

Ministerium für Kinder, Familie,
Flüchtlinge und Integration
des Landes Nordrhein-Westfalen

Ministerium für
Schule und Bildung
des Landes Nordrhein-Westfalen

www.integration.kreis-hoexter.de
www.kreis-hoexter.de

Kommunales
Integrationszentrum
Kreis Höxter

KULTURLAND KREIS HÖXTER